

<input type="checkbox"/> Bi xêr hatin ser Azadiya Welat							
<input type="checkbox"/> Azadiya	<input type="checkbox"/> Nûce	<input type="checkbox"/> Kurve	<input type="checkbox"/> Jin	<input type="checkbox"/> Zimanê	<input type="checkbox"/> Cand	<input type="checkbox"/> Nirxan	

Azadiya Welat

NÛÇE
JIN
CÎHAN Û DÎPLOMASÎ
KED Û ABORÎ
ZAROK Û ZIMAN
ÇAND Û HUNER
CIVAK Û JIYAN
NIRXANDIN
HEVPEYVÎN
ZAZAKÎ/SORANÎ
QERF Û HENEK
TEKNOLOJÎ
NÛÇEYÊN GRÎNGTIRÎN

Bigere

Bigere

RÛPELÊN PDF
DERKET!

<input type="checkbox"/> RÛPELÊN BI PDF

Abdulla Pêşew

Rênas Jiyan

Gava hûn vê pirtûkê* bixwînin; ji ber ku êdî we yê ew xwendibe hûn ê tê de dilê helbestkarê wê bibînin; hûn ê ewil sist bibin, bi dû re hûn ê li ber xwe bikevin û hûn ê bi dizîka di ber xwe de bêjin, “Çima heta niha helbestkarekî min î wiha dilbaz çênebûbû û dilê min li hezkirina welatê min rehet nekiribû?”.

Gava hûn vê pirtûkê bixwînin, wê careke din bê dîtin û wê bê peyitandin ku bê tu kes bi qasî helbestkarekî(ê) nikare ji welatekî hez bike. Û ger heta berî xwendina helbestan bi kêlîkekê jî hûn îkna nebûbin, piştî xwendina helbestan hûn ê jî îkna bibin û hûn ê di heqê camêran de rûnin.

Weke lektorê pirtûkê K. Bajar jî dibêje, “Helbestkar gava biçûk bû jî “ax” xwariye û mezin bûye jî dîsa “ax”ê dixwe.”. Belê mêrik hey “ax” xwariye, lê axa welatê xwe, gava dîtiye ku hinekan ew ax êşandiyê ew jî pê re êşiyaye, pê re têkoşiyaye, ji ber ku ew yê axê bûye û ax jî ya wî bûye, ango ew ji hev bûne, ango ew yên hev bûne.

Xwariye-nexwariye jê têr nebûye, heger hûn helbestên ji axê meraqê dikin bê ka tahma wan çawa ye, fermo hîlbijartinên A. Pêşewî bixwînin, an jî “bixwin”.

Deverên ku ew çûyê, yên weke Moskow, Trablûs, London û Helsînkîyê... li her qonaxê, li her bajarî “ax”a ku bi xwe re biriye ji bêrika xwe derxistiye, pîvazek ji wan bajaran deyn kiriye û wî her du bi hev re xwarine û di ser de jî qedehek “bêrî” bi ser xwe de dakiriye; jixwe ev taybetmendî giş yê “helbestkarên welatan” bi xwe ne. Bingeha helbesta wî, her bûye welatê wî, her bûye “ax”a wî, tesîra ku deverên, bajarên biyanî li helbesta wî kiriye bi tenê bi qasî pîvaza ku ji wan deveran hatiye deynkirin e. Hinek helbestkar hene, “helbestkarên welatan” e, di dinyayê de hemû daxwazên xwe îptal dikin û bi keftûleft pratîk û poetîkaya xwe ji bo serbestiya welatê xwe seferber dikin, jiyana xwe jî û her wiha temenê xwe jî; lê gava destên xwe ji jiyane dişon jî tu carî bi poşmanî, li dû wê jiyana ku di wê de bihurîne nexel nexel li pahniya wê nanihêrin, ji ber ku li gorî wan serbestiya welatekî, hêjayî her tiştî ye. Bextewariya “helbestkarên welatan” ji aramiya rûyên wan pir baş kişf dibe. Di edebiyata kurdî ya nûjen de kirasê “helbestkarê welatan” ji her kesî bêtir li Abdulla

 Aç[çekbe
nakin](#)


PIR:
Li gor
helwe
li dijî
Tirkî
be?

- Di
xv
li l
be
- Di
bê
- Di
riy
es:

 L[Enc
Pi](#)

Den

[Samî](#)





[Tûrik Online](#)

A.W. Malper



Girêdanên Kurdan



Pêşewî fesiliye.

Gava carina mirov dike bimire, an jî divê êdî bimire, lê mirin, heta demêke din xwe taloq dike û derfetê dide ku mirov bi miradê xwe şa bibe, ji wan tiştan, yê ku mirinê taloq dikan, yek jê jî "bêrî" ye; yanî ger "bêrî" xurt be zora mirinê dibe. Di helbestên A. Pêşewî de "bêrî" çavkaniyeke gelekî xurt e, ev bêrî carina ew qasî xurt bûye ku gava Pêşew li welatê xwe Kurdistanê bûye jî, refleksa wî ya bêriyê her aktîf şuxuliye, êdî kesayeta wî û her wiha kesayeta helbestên wî jî bêbêrî debar nekirine.

Welatek, an bi derewan ava dibe, an jî bi helbestan.

Welatên bi hevîrtirşê derewan ava bûbûn, tu xêrê nagihînin mirovên xwe; û zarokên xwe roj bi roj dixwin heta ku wan diqedînin; ji estetîkê, ji lîrîzmê û ji pêşketinê qut in û rûyê xwediyê xwe fedîkar derdixin; lê hinek welat hene ku bi helbestan dolê dixwin, ji lew re bi qasî helbestan bedew in, bicoş in, mezin in û bişeref in, gava mirov di wan de dîjî weke ku mirov di helbesteke xweş de bijî mirov li jiyane dibanînin, helbestkariya Pêşewî di vê xem û baweriyê de hewl dide ji bo ku biherike.

Her welat dişibe helbesta xwe; her helbest dişibe welatê xwe. Poetîkayeke bilind û serbest destbirakê welatekî bilind û serbest e jî; kişwera helbestên Abdulla Pêşewî ewil bi bayê bêriyê xwendevên pêşwazî hundirê xwe dike, bi kulê çîroka xwe jê re vedibêje û bi dû re bi azadiyê xwendevanê xwe bi rê ve dike, di heman demê de kişwera helbestên Abdulla Pêşewî hem xwendevanê(a) xwe dike xwedî "helbest" hem jî dike xwedî "helwest" ku di vê demê de pêwîstiya me gelekî ji her duyan jî heye.

Abdulla Pêşew, Hilbijartin, Weşanxaneya Belkî'yê, Gulan 2006.

[[Vegere ser Rênas Jiyan](#) | [Rûpela Nivîskaran](#)]



Nivîskar: **Rênas Jiyan.**

- [DERBXWARÎ](#)
- [Bimanekirin an jî "Bêmane"](#)
- [LI SER ARKETÎPÊN TEKSTÊN PÎROZ](#)
- [Ketin û têwerbûn](#)


[Têkoş](#)

[Ayşe](#)



[Artêşer de](#)

[Xelîl](#)



[Gelo](#)

[Ahmed](#)

